

SEWAD (MEWLANA EBDULLAH BIDLÎSÎ "REŞIK ")

Û

VERGÊRA ÇÊRISTA LELÎ Û MECNÛN

Bi ismê te xudayê hey ekber
Ewwel bikem ibtidayê defter

Bê ismê te ibtidayê nabe
Bê namê te name nasewabe¹

Li dirêjîya mêjûyê da çirayê zanist, huner û edebiyata her netewekê li bin sîwana asayiş û desthilatê, bi taybet desthilatdarên xemxor, geş bûye û rêka pêşdaçona wî netewî li hemû buwaranda ron kiriye.

Kurd, yek ji wan neteweyane ku mixabin heta nihe cuxrafiyaya wan li dirêjîya mêjûyê da meydana şer û pevçonên; leşkerên Impiratoriya Rom û Îranê, bora derbasbûna dînê Islamê û berfirawan bûna wê bo cihanê, kêş mekêşa Sefewiyan û Usmaniyan û nedîtina asayişê û nebûna desthilatdariyek xobixofî û hevgirtî û yek parçe bûye. Eve jî bûye sebeb, wekî têtê çaverêkirin pirtûkxana zanist, huner û edebiyata kurdê, ligor pêşda çona cihanê bi giştî û cînanan bi taybetî dewlemend û pirbar nîne.

Ser wê reşa bas lêhatekirin, em dibînin dema ew cuxrafiyaye li hindêk dewrên mêjûyê da, dibîte xudanê hindêk desthilatdarî yên herêmî û xudanê asayşek berçav û giringî dana desthilatdaran bi zanist, edebiyat û hunerê, em bûne xudanê hindêk berhemên giring û pirbar.

Zanist, huner û bi taybet edebiyat di serdemên desthelatdariya Mîrînşînan; Bidlîs, Hekarî, Cizîr û Botan, Amêdî, Erdelan, Baban, Soran û Mukuriyan û... serî hildaye û pêşketinekî berbiçav hebûye û têkçona wan mîrînşînan bûye sebebê paşkevî û nemana dahênanên nivîskî.

Li Mîrînşîna Bidlîsê, liber hebûna serweriyekî zêdetir ji hemû mîrînşînan diye herêmî û pejiwandina wê ji layê desthelatdarên Usmanî û Sefewiyan û xemxoriya desthilatdarên wê mîrînşînan û giringî dana wan bi zana û zanist, huner û edebiyatê û nawendên zanistî, bû sebebê nivîsîn û berhem înanan pirtûkên cihê reng û heta vergêrana pirtûkan ji zimanê bîhanî bo ser zimanê kurdî.

Nivîsîn û vergêran du çiqên edebiyata nivîsînkî ne, ku her yek ji wan li cihê xo da giringiyek taybet heye. Nivîser hespê pênûsa xo li meydana zimanê ku lê şarezaye, diterqînît. Lê vergêr dibît, hem suwar çakê meydana zimanê nivîsînê û herwiha li zimanê ku nivîsê divergêrît, bît. Vergêr hewil didet babeta edebî yan zanistiye zimanekî bîhanî bi netew yan hev zimanên xo bidete nasîn.

¹ - Du malikên destpêka çêrsta Leylî û Mecnûn, nivîsîna Can Muhemmed Xakî, ku sala 1302 ê k, vehûnaye. Destnivîsa vê çêrste û çend destnivîsên diye kilasîkên kurd, hevalê hêja Koroglo Kara asalan dane min

Çêrista Leylî û Mecnûn bi zimanê kurdî, cara yekê bi destê helbestvanekê binavê "Sewadî" ji Farsî bi Kurmancî hatiye vergerandin.

Heta niha Sewadî bi başî nehatiye nasîn û navê wî jî nediyar e. Tenê tişta ku li Sewadî liber destê me ye vergêra nezîma "Leylî û Mecnûn" e ku ew bixorê basê sebê vergêrandina vê çêristê û dem û roj û sala wê diket.

Sewadî li pişka siyê, di 60 malikan da, basê danê salê, wesfa siruştê, meh, pesnê desthelatdarê serdema xo, çawaniya vergêrana vê nezîme yan çêristê, dem, roj û karê xo û sala encamê dana vî karî kiriye.

Sewadî wiha dest pê diket û dibêjît:

Rojek ku buhari 'alem ara

Etles kiribû li baxi sehra

...

Xurşîd li xurfeya hemel bû

Meh jî li teraziya xelet bû

Elqise di vê buhari merqûm

Der zil û penahi mîri merhûm

Mîrê ku felek li wî muessif

Zil 'iz û 'ula emîni Yûsif

Heta ku hebû li texti dewlet

Ba 'edl û sexa û şer' û sewlet

Alayê hikûmetê qewî bû

Hukmi wî kitabi heq rewî bû

...

Sakin li serayekî muneqes

Dilgîr û mureteb û mufereş

Rûniştibûm ez ji pencerayê

Fikirî me seharî û hewayê

Dagirtme ber xwe ez mitalan

Pamal kirim xem û xiyalan

Nagah mi dî derî guşa bû

Şemsek ji derîve muncela bû

Roja feleka kemali irfan
Begzadeyê 'alî Ebdullah Xan

Durra qutiya emaret û cah
Şemsa feleka terîqet û rah

Sûret melek û firişte sîret
Berçîsi dili felek behîret

Memdûhi dev û dili 'erîfan
Serdari newadir û şerîfan

Derrak û hemûl û zûkiyaset
Ba hilm û kemal û ba feraset

Şahîni 'irûci ewci dewlet
Enqayê semayê zîb û şewket

Mehmûde xisal û xûb efa'l
Şayisteyê pîşgahi iclal

Mensûbi ji dûdmani me'lûm
Sulbiyeyê nefsi mîri merhûm

Ew hat û selam û merheba kir
Pirsa me kir û dilê me şa kir

Rûnişt û bi leb kirim muşeref
Exbar û qises kirin museref

Mebhes vedikir ji her kalamê
Heta ku gihaye vê meramê

Go şe'r û nezîme xoş kelamin
Meqbûli cemî'i xas û 'amin

Hasil li me kir kemali teklîf
Ilhah û teselutek bi teltîf

Bo xatiri 'atirê mubaerk
Esla me nebû xilasî carek

Pursîm ji wî muradi meknûn
Go tercumekî ji Leyl û Mecnûn

Mewzûn bikerî ku em bizanîn
Lewra ku bi Farisî nizanîn

...

Ligor wan malikên jorî diyare ku helbestvan, wesfa danê buharê û siruştê derdora xo diket û dibêjît;

Xurşîd li xurfeya hemel bû
Meh jî li teraziya xelet bû

Li meha Hemel, (burca yêkê ji dazde burcên Hetawî û hemberî Adarê û meha sê yê ya sala zayînî) ku şev û roj ne wek hevin, li serayekî rayêxistî û xoş û dilgîr rûniştîye û kûr di nav fikran da çoye. Li wê demê da kesek têtê jor û ligor pesindana helbestvani, ew kesekî xudan qedr û hurmet û desthelatdar e.

Çona Ebdullah Xan (Evdal Xan) bo bal Sewadî, nîşana giringî dana wî desthelatdarî bi, edeb û zanist û kesên zana û edîb û bilîmete. Eva jî reftarekî newazeye Evdal Xan ye. Desthelatdar xo nagirin biçine xizmeta zana û aliman û berevajî, ew gazî wan diken ku biçine dîwan û xizmeta wan û eger encamdana karekê jî ji wan bixazin, emir diken, ne teklîf! Lê Evdal Xan, xudanê wan pesnên ku Sewadî didet, teklîfê li wî diket Leylî û Mecnûnê ku bi Farsî ye, vergêrte kurmancî ku xelk baştir têbigehin.

Sewadî herwiha dibêjît;

Hîna mi biser ve ibtida kir
Der şehir di halê şehre wakir

Neh roj tamam paş newrûz
Menqûş mi kir nigînê pîrûz

Der weqti mudetrisi melik kîş
Yek bîn û yek axiv² hem yek endîş

Ummani 'ilim muhîti irfan
Qemqami fezil semayê iz'an

Cibrîl siyer sifet Mesîha
Rewşen kerê hikmet wezîha

² - "Axir" hatiye nivîsîn. Ya rast "Aiv" e. Xudanê nêrînekê, axivtinekê û ramanekê. Eve jî wek dirûşma Zerteşt "Ramana çê, Axivtina çê û Kiryara çê" ye.

Alayê belaxet û celalet
Sultani sulalet û fezalet

Dil lewh û zuban qelem zuha bal
Yûsif li serîri hikmet û hal

Sewadî roja nehê newrozê, demê ku dersbêjê bîr û bawriyên melikê xudanê "yêk nêrîn, yêk gotin û yêk ramanê, herwiha behra zanîne û uqyanûsa irfanê û Cibirîl reftar û sifet Mesîha, alayê belaxet û şikomendiyê û sultanê bereya serweriyê ye" karê vergêranê destpê diket û ew karê wî jî, li bajêrî deng vedidet.

Sewadî herwisa, basa sala encamdana vê vergêranê û temenê xo diket û dibêjît;

Mexz û dev û lêv û se'yê sinne
Tarîx jî lew ji "Mexz"i sinne

...

Yarebb evî nigarê faxir
No baweyê baxi dewrê axir

Mehfûz bikey ji bê fesalan
Sethî û seqîm û bê mitalan

Sewadî dibêjît; Mêjî û dev û lêvên wî salekê xebitîn, ku wê demê tarîx "mexiz" bû. Bi hisaba ebcedî "mexiz" dibête sala 1047 ê koçî. Herwisa li xudê diparît, ew berhema giran biha "no bawe" berhema nû ya "baxi dewrê axir", mebest dewrana kalîtiya wî, ji afeta nezanan, bi parêzîtin.

Bona piştrastkirina sal û serdemê vergêrandina vê nezîmê û herwiha peyda kirina sere davekê bo nasîna Sewadî, em naçarin serî li pirtûkên mêjûyî, ku basa desthelatdarên kurd û mîrînşînên Kurdistanê û zana û bilîmetên wê diken, biden. Girîngtirînê wan pirtûkan "Şerfnameya Şerf Xanê Bidlîsî" û pirtûka "Seyahet Nama Ewliya Çelebî" û herwiha pirtûka "Tarîxi Meşahîr Kurd" ya Baba Merûx Rûhanî (Şîwa) ye.

Nivîserê Şerfname yê ku sala 1005 ê nivîsna wê bi dawî îname, di fesla çarê da basa bajêr û Kela Bidlîsê û desthelatdarên wê diket û li cihekêda bal dikêşite ser alim û zanayên wî bajêrî û dibêjît; hertim mirovên jêhatî û zana li wî bajêrîda vêragiheştine. Bidlîs cihê berhevbûna zana, alim û bilîmetan bûye û navê hindê wan rêz diket ku yek ji wan;

- Mewlana Ebdullah navdar bi "Reşik" yanî Melayê Reş; (Mewlana Ebdullah Bidlîsî "Reşik") dersbêjê medresa Idrîsiye ye û ew jî yek ji zanayên bijareye.

Ewliya Çelebî, dema basa nasandina Bidlîsê diket, dibêjît; "Bidlîs kelehê li wilayeta Kurdistanê ye ku ketiye destê gelek melikan... Niha jî li sala (920) ê ra ku Xanê Bidlîsê piştî xwe bi Selîm

Xanê yekêve girêda, desthelata wê girte destê xo û pişt bi pişt Xanîtiya wê deken û bi fermana şahî di belgenaman da nazinavê (Xanê Payebilind) tête nivîsîn...

Ewliya Çelebî di bergê 4 ê û berperê 93 ê da, basa alim û zanayên Bidlîsê diket û paşê dibêjît; "Dema ez li vî bajêrî bûm (sala 1065 ê berî hêrşkirina ser Bidlîsê û şikiyana Evdal Xan di roja sê şembî 25 ê Remezana sala 1065 ê Koçî 06/05/1034 Hetawî, 28/ 07/1655 zayîni û reviyana wî bo layê eşîra Mukirî), heft helbestvanên xudan dîwan li wê bûn, ku yê herî navdar, Seydayê Binvîse Dîwana Xani bûn... Heta dîwana Xemseye Nizamî jî hebû...

Ewliya Çelebî herwiha dibêjît; Dema ku em mêvanê Evdal Xani bûn, ewî 120 (sed û bîst) pirtûkên giranbiha, ku taybetî melikan bûn, wek; Tefsîrên Qazî, Buxewî, Keşaf, Qamus, Teqwîm Buldan, bi diyarê dane Ibrahim Paşa.

Ewliya, herwiha di pesnê Ebdal Xani da, basa şareza bûna wî di hizar fenan da diket û dinivîsît; "Bilî şarezabûna di Felsefê û limên Xerîbe û Ecîbe, Kîmya û Sîmiya da, şarezayê Hedîsê Sehîhe ye. Hekîmekî hind lêzane ku kesên wek; Calînûs, Buqrat, Suqratê filsof û Fîlos, bal wî nayêne hesabê... Xan ligor dewrana xwe nebiznas, karzan û xûngirekî tam bû... Heta mirovên ku heştê salî bûn û liber bengîni yê jar û lawaz bibûn, dibirine serşokê û wisa derman dikir ku bi ziman nayête pesn dan. Nexoş di sê roja da dibû mirovekî din. Mirovên ku razê ra ketiban û hestiyên wan hûr biban, wisa serhevda tîna ku paş heft rojan dirabûne ser pêyên xwe. Dema suwarî hespê xwe dibû û holanê dikir, te digot qatî Rustemê zeman yan lehengên Îranê ye. Kiryarên wî ligor kitêban bû. Nexaşiyan hespa baş dinasîn (beytarekî tam bû). Nêçîrvanek bê heval bû û gelek teyrên nêçîrê xudan dikirin. Xan di nasîna nexaşiyan wan teyran da Menûçehir bû. Hindek emeliyat dikirin, dimikê wan kurt dikir û baskên şikestiyê wan girêddan û dicebirand... Ev Xane gelek jêhatî bû. Hind şareza bû, eger kesekê ku çil sal bû liber ava reş, çavî wî kor ba û dunya nedîtba, Xani ava reş li ser çavên wî dirakir û ewî dikarî carek dî bibiye xudanê bînahiyê. Çavên ku perda sipî serda hatiba, pê şîşkekê, wek perda piyazê dirakir. Di ilmê binasaziyêda gelek şareza bû. Li hunerîn sehafî, resamî û xetatî yê da jî xudan behre bû. Li qesîde gotinê da te digot "Ezmî Zadeyê Haleti" ye. Behra meanî bû û kitêba Erebi digirte destê xwe û bi Farsî dixand. Turkî û Farsî baş dizanî. Devê, şûrên ku ewî çêkiriban, nedivergeriyan...

Kitêbin taybet bi Xan ebdal, yên ku hatine firotin:

- 17 (hevde) bergên taybet û cewahirbend, ku bo milûkan, bi xetê xetatên navdar hatibûne nivîsîn...
- 1300 (hizar û sê sed) kitêbên bi nîrx ku bi bergêkî law hatibûne pêcan û liser kaxezên Xitayî, Dimişqî, Semerqndî hatibûne nivîsîn...
- 70 (heftê) lib Tefsîrên Şerîfe...
- 1300 (hizar û sê sed) kitêbên Hedîsên Nebewî...
- 120 (sed û bîst) berg Şehnama Firdewîsî Tusî ku bi xetên teilîq hatibûne nivîsîn...
- 1000 (hizar) berg; Pênc Kitêbên Nizamî, dîwanên Hafîz û Urfî. Gulistan û Bûstan, Nêmietullah, dîwana Mela Camî, Serbora Helbestvanan ya Hesên Çelebî, Serbora Letîfî, dîwana Saib, dîwana Baqî, dîwana Nefî, dîwana Nisarî, dîwana Enwerî, dîwana Xaqanî û gelek kitêbin wek evane hatî neqîşandin, ku bi xetên cihê reng hatibûne nivîsîn, hebûn.

- 260 (dused û şêst) parçe berhevokên balkêş, ku her parçeyek, bayî sed qurûşa bû û her yek bi xetekî ciwan hatibû nivîsîn.

Çelebî herwiha basa gelek pirtûkên cur be cure pirtûkxana Xan Evdali diket, ku barê heft hêştiran bûn û erzan firoş kirin, ku yêk ji wan Nezîma Pend Name ya Şêx Etar, vergêra Emîr Çelebî bû....

Ewliya Çelebî herwiha basa nivîsînê Xan Evdali bixor diket û dibêjît:

- 76 (heftê û şeş) berg pirtûkên Xan bixor bûn ku bi Farsî, Erebî û Turkî û 105 (sed û pênc) risalên curbicur, bi Farsî hatibûne nivîsîn.
- Herwisa; 200 (du sed) xerîtên kêşayî ye çapa firengê, pirtûkên coxrafiya û heyet û hikmetê hebûn ku mirov bi dîtba wan heyirî dima. Pirtûkên giya û pancarên dermanî û limê şirovekirina endamî bedenê mirova pê resmên ku li ferengê hatibûne çapkirin û 200 (du sed) berhevokên balkêş ku pê qelemî ecemî û ferengî hatibûne nivîsîn û xemilandin ku nexşên wan bi destên kevalkêşîn navdar wek şah qulî, welî Xan, şemsî Xan, malik, erjeng, axa riza, mihemed riza, bêhizad hatibûne kêşan û mirov li dîtina wan têr nedibû...

Sewadî kê ye û ev çêriste kengê vergêraye:

- Şeref Xanê Bidlîsî sala 1005 ê koçî (1596 ê z) nivîsîna Şerfname yê tewaw kiriye. Ewliya Çelebî sala 1065 ê koçî (1654 ê z) yanî pêncê û neh salan paş şerf Xanî derpêça çarê ya Seyahetname xo nivîsiye û basa Bidlîsê û Ebdal Xani diket.
- Şeref Xan basa kela Bidlîsê û desthelatdarên wê diket û dibêjît; vî bajêrîda hertim mirovên jêhatî û zana vêragiheştine. Yêk ji wan Mewlana Ebdullah navdar bi "Reşîk" yanî melayê Reş; (Mewlana Ebdullah Bidlîsî "Reşîk") dersbêjê medresa Idrîsiye ye.
- Ewliya Çelebî dibêjît; ... Niha jî li sala (920) ê ra ku Xanê Bidlîsê pişt xwe bi Selîm Xanê yekêve girêda, desthelata wê girte destê xo û pişt bi pişt Xanîtiya wê deken û bi fermana şahî di belgenaman da naznavê (Xanê Payebilind) tete nivîsîn.
- Sewadî pesna Mîrê Merhûm (Şerf Xanê Bidlîsî) û Ebdullah Xan (Ebdal Xan, Evdal Xan) ku jî pişt (sulbiye) wîye, didet. Ev gotina Sewadî nîşan didet ku ewî desthelatdariya Mîrê Merhûm (Şerf Xani) jî dîtiye û niha di serdemê desthilatdariya Ebdullah Xani dijît.
- Ewliya Çelebî jî basa heft helbestvanên xudan dîwan li dîwana Ebdal Xani diket, ku yek ji wan "Binivîsê Dîwana Xani" ye.

- Sewadî jî di helbestek xo da basa hebûna dîwana helbestên xo diket ku di nav xelkê da bernîyasin û dibêjît;

Bê misal û bê 'edîlm ger çî bê rexbet zelîlm
Xweş li hale min delîlin beyt û dîwanî di min

Gah bergah eşkerane pur di nêv 'amê belane
Mislê rojê purr celane xal û nîşanê di min

Milkê Misr û burci keywan baxê cinet cayê rizwan
Ew semaiê mah û seywan text û dîwanê di min

- Sewadî jî dibêjît dema ev çêriste vergêrayî dersibêj bûye.
- Yekgirtina pesindana Sewadî li Ebdullah Xan û awayê baskirina Ewliya Çelebî li ebdal Xan, diyar diket ku herdu basa kesekê diken, ew jî Evdal Xanê Bidlîsê ye.
- Sewadî basa Bidlîsê naket. Lê dibêjît dema karê vergêranê dest pêkirî di "Bajêr" da deng veda û dinav çêristê da dema basa sunetkirina Qeysi diket, îşareyî gazî kirina mezinên "Serhedê" didet û dibêjît;

Bavî bi hezar derd û minnet
Îna ku biket ji bo wî sunnet

Ez serhed û Kûfe ta bi Besra
Qasid bi qebîleyan hinêra

Înan wî ekabiri qebîlan
Ji eqiran û misal hem edîlan

- Bidlîs jî dikewîte nav sînorên Serhedê, û navenda eşîreta Rojikî ye.
- "Sewad" peyvek Erebiye û bi mana "Reşayî"ye û "Sewadî" di kurdî da bi mana "Reşîk"e.
- Ligor wan agadariyan em dişên bêjin ku "Sewadî" "hemen" "Mewlana Ebdullah navdar bi Reşîk" yanî "Mewlana Ebdullah Bidlîsî" ye ku di serdemê şerfXan da dersibêjê medresa dirîsiye ya bargahê û di serdemê Evdal Xanê Bidlîsî da jî "ders bêj û binivîsê dîwana Xan" bûye.

Herwiha ligor wan malikan "Sewadî" (Mewlana Ebdullah Bidlîsî "Reşîk") roja nehê, paş Newrozê li danê Buharê, yanî roja Duşenbî 14 ê meha Zilqeydeya sala 1047 ê koçî, beranber digel 29 ê Adara sala 1637 ê zayîni û 9 ê Newroza 1017 tawî (14/11/1047k, 09/01/1017h,

29/03/1637 z) li devirana kalîtiya xo da vergêrana Leylî û Mecnûnê destpêdket û paş salekê, tewaw kiriye.

Heta niha vergêrana nezîma "Xusiro û Şîrîn" ya Xanayê Qubadî, bi devoka Hewramî, ku sala 1153 ê koçî (1740 z) ji ber "Xusiro û Şîrîn" ya Nizamî hatiye vergêrandin, wek yekem vergêra kurdî ji zimanê bîhanî dihate nasîn. Lê destkevtina nezîma "Leylî û Mecnûn" û sala vergêrandina wê, nîşan didet ku yekem kesê ku karê vergêrandina helbestê li zimanê bîhanî bo ser zimanê kurdî encam daye Sewadî "Mewlana Ebdullah Bidlîsî navdar bi "Reşîk" bûye ku sala 1047 ê koçî (1637 z) li serdemê Ebdal Xanê Bidlîsî, li Bidlîsê hatiye vergêran. Ev vergêre nêzikî qirnekê dîroka vergêranê bi zimanê kurdî pêş têxît. Ji layekî dinve nîşan didet ku karê vergêrandina pirtûkan ji zimanê bîhanî bi kurdî, hevkatê digel di serdemê Şêx Ehmedê Cizîrî û nivîsîna dîwana Cizîrî û Feqî yê Teyran. Vergerandina vê berhemê, dikevîte berî ji dayîk bûna Şêx Ehmedê Xanî. Bi wî awayî em dişên bêjin berî ku Ehmedê Xanî çêrista Mem û Zînê bi kurmancî binivîsît, çêrista Leylî û Mecnûn ji Farsî bo kurdî hatiye vergêran.

Sewadî û vergêrana Leylî û Mecnûnê

Çêroniga Leylî û Mecnûn, yek ji wan çêrongaye ku heta niha, çend helbestvanan bi çend zimanê cihê, wek; Farsî, Turkî, Peştû, Cixetayî û Kurdî di qalibê çêristê (mesnewî) da vehûnane û raberê xandiwanên xwe kirine. Herwiha ev çêriste bi zimanên; Turkî, Ermenî, Inglîsî, Feransî, Almanî, Rûsî û Kurdî jî hatiye vergêrandin.

Sewadî basa vergêrana Leylî û Mecnûnê li zimanê Farsî kiriye, lê nedaye diyarkirin ku liber ya kîjan helbestvanê Fars vergêraye. Ber wê hindê berayîkê em çavekê bi çêristên helbestvanên Fars da bixîşînin û vergêra Sewadî di gel wan bidene ber hev û diyar biken li ber ya kê vergêraye.

Nizamî (Hekîm Ebû Muhemmed Ilyas kurê Yûsuf kurê Zekî kurî Mueyîd Nizamî) berî her helbestvanekê, di sala 584 ê li çerxa şeşê koçî, çêrista Leylî û Mecnûn li 46 pişkan û di 3653 ê malikan da bi zimanê Farsî vehûnaye. Bi gotina nizamî, ewî ev çêriste di kêmtir li çar heyîva da nivîsiye;

În çar hizar bêyt ekser
Şud gufte bi çar mah kemter
Ger şuxli diger heram bûdî
Der çare şeb itmam bûdî

(Ev malikene ku herî zêde çar hizarin, di çar mehan da hatine gotin. Ger min karekî dî neba, mi dê çar şevan da tewaw kiriba)

Nizamî, di vê çêristê da basa evîndariya kurê serokê erebê amirî bi navê Qeys, û kiçekê binavê Leylî, diket ku hev dersê hev bûn. Lê piştî ku mal baba Leylê li evîndariya wan dihesin, nahêlin Leylî biçîte dersxanê û ewê malbend diken. Qeys ku li dîtina Leylê bê par dibît, hewayê evînê didete serî û li çol û çiya dikevît û xelk vedizandin ku dîn bûye û navî Mecnûn lê diken. Dema babê Mecnûn dizanît ku ev evîndar e, diçîte xastina Leylê, lê babê Leylê, dîn bûna Qeys diketê hecet û Leylê nadetê. Leylî layekê ra di agirê evînê da disojît û layê dîve, Mecnûn dîsa li çol û çiya dikevît û dibîte benûştî devê xelkê.

Kesek dewlemend bi navê Ibni Selam, ku heretê lavînî yê daye û jin xaze, nav û dengî xweşkiya Leylê dibihêt û xazgîna dirêkete xastina Leylî yê û babê wê jî bi zavatiya Ibni Selam razî dibît. Leylî jî girêdayî urf û adetê eşîrêye, bê emriya babê xo naket û nejidil mêr bi Ibni Selam diket. Mecnûn bi bihîstina wê xeberê, dest ji dunyayê dişot û dikevîte naw refên kovîyan. Camêrek binavê Nofel ku mirovekî binav û denge û serpêhatiya Mecnûn bihîstiye, dema ku diçîte nêçîrê, rastî Mecnûn têt û dilê wî bo Mecnûn disojît û belênê didete Mecnûn ku eger bi darê zorê jî bît, Leylê bo Mecnûn bînît. Nofel liber belêna ku daye Mecnûn, naçar hêrişê oba babê Leylê diket û şerek giran dest pê dibît. Mecnûn liber evîna ku bi Leylê di dil da heye, naxazît çi zerer li oba babê Leylê bikevît û ji Nofel dixazît dest ji şerî helgirît. Dîsa li çola dikevît. Leylê digel Ibni Selam dawetê diket, lê nahêlît lê nêzîk bît. Dayk û babê Mecnûn liber kula kurê xo dimirin. Mêrê Leylê nesax dikevît û dimirît. Leylî û Mecnûn bi her aweyekê dixazin hevdu bibînin û suknaîyek bikevîte dilê wan, lê liber lomekirina xelkê fedî diken nêzîkî hev bin û her du her di agirê evînê da disojin. Leylî wefat diket û Mecnûn pê dizanît û diçîte ser gora wê û gora Leylê himbêz diket û ew jî wefat diket. Dema xelk pê dihesin, tên û gorekê li rex gora Leylê bo wî dikolin û ewî jî li rex Leylê dispêrine axê. Nizamî bi vî awayî dawiyê bi çêrista Leylî û Mecnûn têtît.

Emîr xusiro dêhlewî (651 -725 k) jî wek dûyemîn helbestvanê faris, sala 698 ê, li çerxê heftê koçî, çêrista Leylî û Mecnûn di 31 pişkan û 1353 malikan da nivîsiye. Lê berewajê Nizamî, navê "Mecnûni Leylî" lêkiriye;

Namesî zi xêyb şud musecel
Mecnûni Lêlî bi eksi ewel

Tarîx zi hicret ançî bugzeşt
Salesî newedest û şîş sid û heşt

(Navê wî li xeybê hate danîn, Mecnûnê Leylî berevajî ya ewel. Tarîxa ku li hicretê derbas bûye, sala şeş sed û nehwêd û heşte)

Emîr Xusrow Dêhlewî bi awayek dî vê çêristê vedigêrît, lê hindekê nêzîkî vegêrana Nizamî ye. Xuda kurekê didete Erbek Amirî û navê Qeys lê diken. Dayk û babê wî gelek keyf xoş dibin. Lê tali' bîn dibêjin ew dê liber evîna kiçekê dîn bît û li dunyayê navdar bît. Qeys diçîte medresê ku kiç û kur têkelin. Qeys û kiçek bi navê Leylê hej hev diken û haj ders xandinê nînin. Xebera evîndariya wan nav xelkê da belav dibît û dayika Leylê jî dibihêt û nahêlît kiça wan biçîte medresê. Qeys liber nedîtina Leylê dîn dibît. Dayik û babê Qeys hewla dermankirina wî diden, lê çare lê nayête kirin. Babê Qeys naçar dirêkete xastina Leylê û babê Leylê dibêjît; kurê we abûra me biriye û ez kiça xo nademe wî. Babê Qeys ku kurê wî dîn bûye û nav xelkê da bi Mecnûn hatiye nasîn, diçîte bal serokê eşîrê ku navê wî Nofele û ji wî dixazît ku çareyekê li babê Leylê biket. Nofel peyayek rêkire xastina Leylê. Dîsa babê Leylê, Mecnûn hevkuîfi kiça xo nezanî û razî nebû kiça xo bidete Mecnûn. Nofel ji wê bersivê tûre bû û êrş kire ser wan. Du heftêya şerek giran bû û gelek kes li her du aliyan hatine kuştin. Hindek kesan ji aliyê mala babê Leylê gotin; bona tewaw bûna şerr, ya baş ewe ku em Leylê bikujin û êdî hecetek bo şerkrinê namînît. Mecnûn ev xebere bihîst û xo gehande bal Nofel û gotê; tu bona dilxoşiya min şerî dikey ku Leylê bo min bînî, lê ew dixazin Leylê bikujin. Tu ber xatirê min vî şerî ragire, ku Leylê neyête

kuştin û dilê birîndare min bê derman bimînît. Nofel dema axivtina Mecnûn bihîst, dest ji şerî helgirt û paşda vegeriya. Paş rawestana şerî, dayik û babê Mecnûn, diçine xastina Xedîce ya kiça Nofel bo Mecnûn. Mecnûn li gotina wan dernakevît. Leylî vê xeberê dibihêt û nameyekê bo Mecnûn dirêket û Mecnûn jî bi dilê xo bersiva wê didet. Mecnûn her li çol û çiyayan digerrît. Leylî xewna Mecnûn dibînît û diçîte dîtina wî û şevê digel hev derbas dikan û miraza wan hasil dibît. Paş vegeriyane, Leylî nesax dikevît û dimirît. Mecnûn xebera mirina Leylî dibihêt û xo digehînte oba Leylî. Dema digehitiye wêderê, dibînît Leylî yê ber bi goristanê diben. Ew jî dikevîte dû meytê Leylî. Dema Leylî didanêne naw qebirê, Mecnûn jî xo tavête ser meytê Leylayê û her wê demê rih didet û ew jî dimirît. Leylî û Mecnûn di yek gorêda tene veşartin. Helbestvanê Xurasanî (Nûredîn Ebdulrehman kurê Nizamedîn Ehmed kurê Muhemmed) navdar bi Camî (817 –897 k) di çerxa nehê, sala 889 ê çêrista Leylî û Mecnûn di 21 pişkan û 1003 malikan da bi Farisî nivîsiye;

Kutahîyi înbulend bunyad
 Der heşt sed û nuhfutad û heştad
 Wer tu bi şumari an berî dest
 Based sê hizar û heşt sed û şest
 Şud erz zi teb' fikert endîş
 Der tûli çihar meh kem û bîş
 Der yêkî du sê sa'etî zi her rûz
 Şud teb' ber înburadi firûz

(Ev darêjtina dirêj di heşt sed û heştê û nehê kuta bû. Ger tu bixazî jumara wê bizanî, hiar û heşt sed û şeste. Hate gotin kême û zêde di çar mehan da. Her rojê bi du û sê si'etan hate nivîsin) Camî bi awayek cihêtir ji Nizamî û Dêhlewî, çêrista Leylî û Mecnûn divehûnît. Ew dibêjît; serokê eşîra Erebe Amîrî, xudanê deh kurran bû ku zêdetir keyfa wî li kurrê herî piçûk, ku navê wî Qeys bû, dihat. Qeys kurrekî aqil û têgihêştî bû û keyfa wî gelek li kiçên can dihat. Rojekê hindek kesan basa Leylî û xweşkiya wê bo wî kirin. Qeys ku pêştir jî bi Mecnûn, di hate nasîn, suwarê hêştira xo bû û ber bi obeya Leylî çû. Dema giheşte obê, xelkê gelek qedrê wî girtin û berra çon. Ewî haj çî nebû û çavên xo li Leylî digerrand. Wextekê dengê xirxala hat û Mecnûn bera xo dayê û Leylî dît. Dema çavê wî û wê kete hev, her du, ne bi dilekê, belkî bi sed dilan, evîndarê hev bûn. Mecnûn wê rojê, piştî dîtina Leylî vegeriya û roja dî dîsa bera xo da oba Leylî. Midehekê bi wî awayî derbas bû. Hindek kesa fesadiya Mecnûn bal Leylî yê dikirin. Şevê yekî zikreş ew digel hev dîtina Leylî li bal babê wê kir. Babê Leylî kerbada keça xo kuta. Hindî dikir nedîşeya Mecnûn li oba xo dûr bexî. Rojekê çû bal Xelîfe û şikayeta Mecnûn kir, ku abûr bo me nehêlaye. Xelîfe jî nameyek bo Mîrê deverê rêkir ku biçît û babê Mecnûn haydar biket, kurrê wî belaya xo ji Leylî û mala wan veket. Mîr, babê Mecnûn li nama Xelîfe haydar kir û gotê eger kurrê te nerawestît, dê bête siza dan. Eger bête kuştin jî dê xûna wî badil hewa biçît. Dema Mecnûn ew gotin bihîst, got; mirovî aqil tene siza dan, ez dînim û dîn (Mecnûn) nayêne sizadan. Babê Mecnûn kurrê xo şîret dikir ku dest ji Leylî helgerrît. Lê Mecnûn liser evîndariya xo bû û Leylî jî ji wî xirabtir bû. Babê Mecnûn liber hevkuşî nebûna Leylî di gel Mecnûn, razî nedibû biçîte xastina Leylî. Lê dawiyê çû xastinê û babê Leylî kiça xo neda. Mecnûn wek caran li çol û çiya ket. Lê bi her awayekê dixazît xo bigehînte oba Leylî û heta

carekê wek parsek û xazokekê diçîte ber derê Leylê. Leylê jî kasika parsa wî dişkînît. Rojekê jî ku Leylê diçîte Hecê, Mecnûn jî heta Hecê dû karwanê Leylê ra diçît. Kurrekî Erebe Seqefî dilê wî dikevîte Leylê û diçîte xastina wê û babê Leylê jî kiça xo didetê. Mecnûn xebera mêrkirina Leylê dibihêt û nameyekê bo Leylê dirêket. Mêrê Leylê nesax dikevît û dimirît. Mecnûn rojekê liser rêyekê tûşî Leylê dibît. Dibêjîtê, îro jî min tu dîtî, carek dî kengê ezê bikarim te bibînim? Leylê dibêjîtê; salekî dî dema ez li vê rêkêra divegerm. Paş çona Leylê, Mecnûn salekê liser wê rêkê li benda Leylê dirawestît û hind bê liv dibît ku çiwîk liser serê wî hêlînê çêdiken û cûckê xwe fireoke diken. Piştî midehekê Mecnûn dimirît û Leylê xebera mirina wî dibihêt û ew jî dimirît û ewê jî li rex gora Mecnûn diveşêrin. Camî jî bi vî hayî çêrista Leylî û Mecnûn bi dawî fînît.

Mawlana Ebdullah Bidlîsî (Sewadî); ku sala li dayikbûn û wefata wî nediyar e sala 1047 ê çêrista Leylî û Mecnûn ji farisê bo kurdî vergêraye. Sewadî li vergêrana xoda rengekî silamî û herêmî jî daye çêristî û basa sunetkirina qeyis û gazîkirina mezinên serhedê bo cejna sunetkirina wî û çona wî bo hecê ji diket û bi vî awayî çêrista Leylî û Mecnûn vedigêrît:

Melikek dewlemend û navdar e 'ereb hebû, lê bê ewlad bû. Karê wî her niza bû. Xudê nizayên wî qebûl kir û kurek dayê. Navê qeyis lêkirin. Lê zarekî lal û bê xeber bû karê wî girî û keser û bê sikûn bû. Rojekê kiçekê ew da ber singê xo û êmin bû. Bêy wê kiçê sebra wî nedihat û herdu bûne mûnisê hev. Kesên bi kiyaset gotin ew kur dê bi şiqê meşhûr bît.

Hîna ku qeyis bû deh salî babî xwast wî sunet biket û qasid rêkire dû serokê qebîlên serhedê heta kûfe û besirayê, gazî kirin û çil roja şahî kirin û paşê kur rêkire mektebê. Li mektebê sefek kur û sefek kiç bûn. Di nav wan da kiçek ciwan û bi edebe ereb hebû ku bû şeyda û hev sirê qeyis.

Şîqa wan kete ser zarê xelkê û fesadan dayika leylê ji wê şîqî haydarkirin û dayikê nehêla keça wê li mal derkevît û biçîte mektebê. Derneketina leylê li mal û neçona wê bo mektebê dibîte seabê dûriketina wê ji qeysî û karê wê şev û rojan girî û zarî bû.

Qeyis jî li mektebê bêzar dibît û li dû rêkekê digêrît ku bikarît leylê bibînît. Cilkên derwêşan diberxo kir û dero dero digeriya heta giheşte ber derê mala babê leylê. Leylê dengê qeysî nasî û bi heceta destgirtina derwêşî xo gehandê û bi dîtina hev şa bûn. Xelkê ku zanîn ew qeyse, zarok duwêxistin û dane ber dar û beran û navê Mecnûn lêkirin û li mihelê dût kirin. Navê Mecnûn kete ser zimanan û Mecnûnî jî cilkên ber xoda diranidin û serkot û tazî çu çiyayê necidê ku teji kuvî û dirinde bûn. Li çiya xezal û kewê ji davikê rizgar diket û berebere teyir û kuvî û dirinde dibine hevalê Mecnûn û li dora wî kom dibin.

Babê Mecnûn ewî li çiya dî nav koma kuvî û dirindan da dibînît. Hindî diket Mecnûn razî nabît vegeirît. Babî bi raspardina melayekê, hindek axa ber derê leylê dikete kil ku bikêşîte çavê Mecnûn û negirît. Dema Mecnûn wê axê dibînît dibêjîte babê xo ez ne dîn û şêtim û ez liber te rawestame û tu çî bêjî ezê bikem. Bab dibêjîtê were em biçine hecê, keibê tewaf biken ku ew tirs û derde li te dût bikevît. Mecnûn razî dibît û digel babê xo diçîne hecê. Paş bicî îna rê û resmeên hecê, Mecnûn diwa kir; ya reb eqlê ji min cuda kî û canê min di dîtîne feda kî. Dêrd min yek e bike hizar û min ji belaya eqlê dût ke. Xeyala meişûq bo min bese û daxê dilê min

zêde kî. Dema babê wî ew gotin bihîstin, bal xo got lac û tedbîr hemî betal in û ew teslîmî qezaya xuda kir vegeyriyane mal.

Giregirên qebîla Mecnûn çone xastina Leylî û dest betal vegeyriyan. Mecnûn rastî xûndarekê hat ku rist kiribûn. Ew rista wî dikete stûyê xu û bo parsê digel xudanê ristê xo digehîne ber derê leylê. Leylê dema dengê girî û zariyê bihîst, zanî dengê Mecnûne û bezî pêşiya wî. Bekoyek pê hesiya û kire gazî xelkê û got wer in ew e Mecnûne. Mecnûn rista xo verisand û dîsa bera xo da çiya.

Dilê axayekî ereb ku navê wî binê selam bû, ketibû leylê û rêkire xastina wê. Babê leylê cihaba erîni da xazgînan.

Paşayek ku navê wî newifele dixazît Mecnûn bibînît. Mirovên newifelî li deştê rastî Mecnûn hatin. Ew digel xo înan û serê wî şuştin û birîne wî melhem kirin û cilkên emîran kirine ber û birine dîwana mîr newifelî. Hindî bera diçon bi çi tiştî razî nedibû. Ewî mîr newifel riswa kir û gotê min teiam û cilik nawên. Daxaza min tenê leylê ye.

Ew halê Mecnûn li newifel kar diket û ew jî mezinekî xo dirêkete xastina leylê. Babê leylê dibêjît bo newifel şerme ku dixazît ez kiça xo bideme dînekî rist kirî. Newifel hêzên xo berhev diket ku hêrişê bikete ser oba babê leylê. Şer navbera her du hêza dest pêbû û hêza newifel pêşda diço. Mecnûn diwa dikir ku babê leylê ser bikevît. Xudê diwaya wî qebland û karîn leşkerê newifel paşda biden û Mecnûn bi dîlî girtin. Roja paştir ku leşkerê newifel ço meydana şerî, hêzên beranber gotinê eger tu şerî ranegirî emê Mecnûnî ku sebebê fitinê ye bikuji. Newifel bi aştiyê razî bû û got hûn Mecnûn berden û leylê jî bila bo we bît. Çawa hûn meslhetê dizanin emê wê biken.

Babê leylê cihab bo binê selam rêkir ku dişet karê daweta xo biket. Ewî dawet kir û Leylî veguhost. Leylê rê neda ew lê nêzîk bît. Ew jî hiviya razî bûna leylê rawesta.

Binê selamî şivanek hebû ku pezê wî li çiyayê necidê diçerand û bilûrek xoş lêdida. Dema ewî bilûr lêdida Mecnûn dihate bal wî û dikete semaiê û Mecnûn û şivan bûne hevalê hev.

Rojekê Mecnûn di kevilê pezekê da xo digehîne obeyê û yara xo bibînît. Dema çavê Mecnûn li leylê ket, halî wî xirab bû û tepê ket. Leylê pêhesiya û hate bal Mecnûn û heta sibê bi hevra dinav pezî da man û roja paştir dîsa Mecnûn tevî keriyê pezî û vegeyriya çiya.

Babê Mecnûn liber kula kurê xo nesax ket û wefat kir. Nêçîrvanekê Mecnûn li mirina babî haydar kir. Ew jî şevê ço ser mezarê babê xo û şîn gêra. Rojekê dayîka wî ço bal û hindî kir ku Mecnûn vegeyrite mal, bê fayde bû. Dema dayîkê dît kurê wê navegerît ew jî li çiya ma û paş çend rojan nesax ket û mir.

Binê selam dizanît sebebê hasil nebûna miraza wî, Mecnûne û qesda kuştina wî diket. Kuvî ji qesda wî haydar dibin û leşkerê wî tar û mar diken û binê selam dikuji. Leylê keyif xoş dibît. Kesekê dirêkete dû Mecnûn ku bêt û bibînît. Mecnûn diçît û leylê dibînît û Leylî dibêjîtê eger hizar daxazkarê min hebin, ez her liser ehda xome. Mecnûn dîsa divegeyrite çiya û leylê jî nesax dikevît û derdê wê nayête dermankirin. Rojekê danê sibê ku rih dida tinê navê Mecnûn liser lêvên wê bû. Leylî dimirît û dispêrine axê. Kesekê xebera mirina leylê gehande Mecnûn û ewê

xeberê qidûmê wî şkandin. Bi halekê zar û nezar xo gehande ser gora leylê û gora wê vekir û meytê yarê gerite bersingê xo û ewî jî rih da. Dema xelkê ew di wî halî da dîtîn. Zanîn şîqa wan heqîqî bûye û her du li rex hev di gorekê da veşartin.

Sewadî jî bi vî awayî çêristê di 771 malikan da divehûnît û bi dawî tînît.

Ev awayê vegêrana çêristê ji layê Sewadî, xûya diket ku Sewadî (Mewlana Ebdullah Bidlîsî "Reşîk") her sê çêristên Farsî Xandiye û gor dilê xo bi awayekî serbixî karê vergêrandina wê bicî îname û yekem vergêrana kurdî raberî Xandewanên kurd kiriye.

Seyid Kafi 'Elweî
01/10/2016

Eve jî helbestekî "Sewadî "ye

"Ey felek dîsa te kul kir derd û êşanê di min
Mislê bulbul meylê gul kir zar û efxanê di min
Şerbeta lefiz û kelaman her di nêva tas û caman
Dane cumle xas û aman cam û fincanê di min
Enber û bîna bixûrî meşela sîna û turî
Menbeia ava tehûrî tê ji zozanê di min
Sunbul û rêhan bicoşin subih û gavan purr xuroşin
Etles û dîba dipoşin bax û bustanê di min
Saqiya ava heyatî Şems wech leb nebatî
Ey dilo carek nehatî hur û xilmanê di min
Helqeyê zulif diyarî girtî ji bayê buharî
Şubhetî tava tebarî çêbû dermanê di min
Helqeyê jengî û xalan wan ji min dil bir bi talan
Şubhetî bayê buharan sebr û samanê di min
Bê misal û bê edîlim ger çî bê rexbet zefîlim
Xweş li halê min delîlin beyt û dîwanê di min
Gah ber gah eşkera ne purr di nêv amê belane
Mislê rojê purr celane xal û nîşanê di min
Milkê misr û burc û keywan baxê cinet cayê rizwan
Ew semayê mah û seywan text û dîwanê di min
Ey dilo dildar yaran enber û zerîn guharan
Kirne nexma qed çînarî dax û guvanê di min
Kuviya birqei di berda sunbul û rîşî biser da
Lê ji derdê min xeberda ah û efxanê di min
Ew eqîq û durr û gewher incî û elmas û cewher
Hulle û yaqût ehmer tê ji sîwanê di min
Kûh û sehra kesk û alin çîçek û rêhan bixal in
Ey dilo rabe mecal in geşt û seyranê di min
Ey Sewadî bes bibêje qisseya îşqê birêje
Berf û baran dirrêje ebri nîsanê di min "

